nespêrin bextê wan…" bigre? Nikane wisa bike. Lêbelê di bûyerekê ku li gund yan jî li navçeyê rû daye, dikane tundtirîn zorbazîyê li jinan bike, qet texsîr nake ku girantirîn cezayê ango cezaya kuştinê pêk bîne. Di têgihîna namûsê de, di têgihîna "namûsa me herimî" de, li gorî cih û zemanê wê, li gorî nasname û pîşeya mêrî cihêtîyên mezin nîşan dide. Divêt meriv bi teferuat li ser sedemên vê yekê raweste. Herwisa, di vira de şaşîtîyek jî heye. Gelo divê meriv li kû derê li vê şaşîtîyê bigere? Gelo divê meriv di nav edetên civakî de li vê şaşîtîyê bigere yan di wê texrîbata ruhî de ku di encama mekanîzmayên zordarîyê yên hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan xistine bin kontrolê pêkhatîye de bigere?

Kurd civakeka wisa ne ku nikanin xwe bi rê ve bibin, rê nayê dayîn ku ew xwe bi rê ve bibin. Kurd û welatê wan Kurdistan hatine cihêkirin, parçekirin û parvekirin… Rewşa kolonyalîzma navneteweyî serdest e. Di navîna Rojhelata navîn de 40 mîlyon kurd bê statu ne. Hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan îdare dikin, gelek xirab îdare dikin. Di vê îdarekirinê de heq û huqûq tune ye; pelaxtin heye, piçûkxistin heye. Li cîhanê ti miletekî din ewqas mezin û bê statu nîn e. Helbet em hay ji pêşveçûnên ku, li derdora Dewleta Federe ya Kurd kû li Kurdistana Başur çêdibin hene. Herwisa, ev jî têye zanîn ku ev yek piştî çendîn berxwedaneka dûr û dirêj û dijwarîyan de çêbûye. Ew hewldanên xwe îdarekirinê ku li parçeyên din yên Kurdistanê rû didin, ji layê hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan îdare dikin ve têne fetisandin. Ger bêhtirî sed salan ev proses li dar be, hingê dibe sedem ku di warê edetên civakî û tenduristîya ruhî de gelek xirabûn derkevin meydanê. Psîkolojîya/derûnîya kesan, ya civakê xira dibe. Civak û kes êdî ji xwe dûr dikevin, dikevin nav prosesa tevlîbûna wê kultura ku li ser wan hatiye sepandin/empozekirin. Ger ev proses demeka dirêj dewam bike, dibe ku ev yek êdî bikeve nav DNAya meriv û civakan. Ewên ku dikanin li hemberî gelê xwe gelek tund bin lêbelê li hemberî hêzên dagîrker, li hemberî kesên ji wan hêzdartir fis dibin. Ev reftarîyên berovajîyê hev, ku di meseleya namûsê de derdikevin meydanê, di wateya rizandinê de ne. Dema ku civaka Kurd, nirxên kurdan bi vî awayî di bin fişardinê de bin, hingê psîkolojîya wan jî xira dibe, rizandineka wisa derdikeve meydanê.

Gelo riya rizgarbûna ji van peywendîyên lanetî, riya rizgarbûna ji vê prosesa lanetî û xwe dirêjî azadîyê kirinê, çi ye? Berîya her tiştî gelek girîng e ku divêt meriv hay ji vê prosesê hebe, ji van peywendîyan agahdar be. Ew kesên ku hay ji vê prosesê bibin, gelek aşkera ye ku dê bi nirxên xwe re bijîn, dê xwedîtîyê li nirxên xwe bikin, dê van nirxan geştir bikin, dê nirxên ku li ser wan hetine sepandin/empozekirin red bikin, her ku biçe dê vegerin ser resenîya/orîjînalîteya xwe. Piştî ku meriv bibe 'xwe', hingê gelek hêsan e ku meriv bigihê mafê xwe, qet nebe di fîilîyatê de meriv dê bibe xwedîyê mafên xwe. Ev prosesa lanetî, ev peywendîyên lanetî tenê dikanin bi vê yekê bişkên.

Zarathustra News & Peyamaazadi.org - zarathustra_news@comhem.se